


Ji Penûsê Jinê Rastîya Jîyanê

RAPERÎN

Dîrok: Cotmeh 2025 Hejmar:17 Biha: 2000

EM HENE



ROJEV

2

Li Dijî Şer, Dagırkerî û
Qirkirina Jinan
Jin Hene

DÎROK

3

Dîroka Têkoşîna li Dijî
Tundîya li Şer Jinan
û Rola Xwişkên Mîrabel

JINA CIWAN

7

GOTINA KU EM BÊJIN
HEYE

LI DIJÎ ŞER, DAGIRKERÎ Û QIRKIRINA JINAN JIN HENE



Roza Lüksemburg bi gotina “an hovîtî an sosyalîzm” bi awayekî herî zelal dîyar kiribû ku li pêşîya hemû bindestan tenê du rê hene.

Îro em tam di vê qonaxê da ne. Hilberîna kapîtalîst, jîyan û çand di hemû hucreyên cîhanê da bi cih bûye. Takekesî, parçeyîbûn û dabeşbûn, ku kevîrên bingehîn ên îdeolojîya burjuva ne, bi zanebûn tene rêxistinkirin û mirov ji mirov û ji xwe bîyanî dibe. Bi milyon mirov neçar in wekî koleyên sermayeya ku bi keda xwe afirandine bijîn. Mafê wan ê biryardanê, hilbijartinê, pirsyarîyê û xeyalkirinê tune. Axa ku ew lê xwe diafirînin û hebûna wan wateya dîrokî digire, bûye cihê îstîsmar, şer û talanê.

Li her devera cîhanê, birçîbûn, xizanî, bêkarî û pirsgirêka koçberîyê heye. Mirovên ku ji kaseyek şorbe ra hatine mehkûmkirin, bê welat hatine hiştin, sirgûn bûne, ji dîroka xwe qut bûne, paşeroja wan ne dîyar e, di nav nakokîya di navbera wurşeya cîhana ferazî û jîyana xizan a rastîn da, ber bi nebextewarî û bêhêvîyê ve tene kişandin. Di vê hawîrdora kaosê ya mezîna da mirovahî di nav êşê da ye. Her ku kapîtalîzm di îstîsmara ked û bedenê da kûrtir dibe, gemarî û rizîn jî kûrtir dibe. Di nav vê gemarîyê da rûyê rastîn ê exlaqê burjuva derdikeve holê.

Xeze tê wêrankirin, gelê ku gelek caran sirgûn bûye careka din dikeverê, zarok li ber çavên cîhanê ji birçîbûnê dimirin. Eşkîyayê herî mezîna ê cîhanê, DYE û Trump, bi Netanyahu ra ji bo wêrankirina Xezeyê û ji holê rakirina Filistînê

peymaneka nû ya çekan a 6 milyar dolarî îmze dikin. Ji bo parastina hegemonyaya DYEyê li Rojhilata Navîn, her tiştê ku Îsraîl a Sîyonîst bike mubah e. Îsraîl li gorî dilê xwe êrîşî Libnan, Yemen, Sûriye, Qeter û Îranê dike, dagir dike. Ne dewleta Tirk a dagirker û serokê wê yê faşîst Erdogan ku xwe wekî parêzvana herêmê dibîne, ne jî dewletên Erebbî din ji derveyî şermezarkirina Îsraîlê tiştêkî din nakin. Qedera Filistînê ne xema wan e, ew bi tirsîna metirsîya potansiyel a Îsraîla Mezin in.

Wan Esed hilweşand û HTŞê ya ku li Îdlîbê perwerde kiribûn û çekdar kiribûn, li Şamê bi cih kirin. Ji 8ê Kanûnê heta îro, di nav salekê da, bi hezaran mirov ji aliyê HTŞê ve hatin qetilkirin. Li herêmên peravê bi hezaran Elewî ji cih û warên xwe hatin derxistin. Bi hezaran jin hatin revandin, tecawizî wan hate kirin, li bazarê hatin firotin, û bûn koleyên seksê.

Qanûnên ku jinan ji jîyana giştî vedigerînin zindana malê hatin derxistin. Karên gelek pîşeyan ji jinan ra hatin qedexekirin, bi destwerdana şewaza jîyana jinan, biryar didin ka ew ê çî li xwe bikin û çawa tevbigerin. Çarçoveya îdeolojîk, sîyasî û exlaqî ya HTŞê ji aliyê rejîma paşverû, mîrserwer û faşîst a Talîban a ku li Efxanistanê bêyî welîyekî mîr qedexe kirîye ku jin derkevin derve, pirtûkên nivîskarên jin berhev kirine, û di dema erdhejê da jî berî her tiştî mîr rizgar kirine, ve tê avakirin. Ji ber vê yekê, bêyî hewcedarîya analîzên kûr, mirov dikare bi tenê li Efxanistanê binêre û bibîne ka

HTŞ dixwaze çî bike.

Yên ku qaşo li dijî guhertoya HTŞê ya bi navê DAÎŞê ra şer dikin, ji HTŞê ya ku bi raman û gotinên xwe berdewama wî ye ra di qanûnên navneteweyî yên burjuva da rewabûnê distînin. Şeybanî ji bo hevdiîtinên fermî dibin DYEyê, Colanî yê bi kravet xwe amade dike ku li NYê biaxive.

Gel, jin, zarok hatin qetilkirin, êşkence li wan hate kirin, tecawiz li wan hate kirin; tu wateya vê ji bo wan tune. Berjewendîyên emperyalîst ên jeopolîtîk xwedayê wan e.

Li gelek deverên Rojhilata Navîn, li hemberî kuştina ku ji aliyê mêrekî ve hatîye kirin, jin wekî “pêguherî” tê bikaranîn. Ev mînak e ku ji bo parastina yekîtiya malbatê jin tene bêwatekirin.

Kapîtalîzm ji aliyekî ve malbatê ber bi hilweşandinê ve dibe, ji aliyê din ve bi zorê hewl dide wê biparêze. Ji ber ku ji bo civakîkirin, parastin û ji nû ve hilberîna serdestîya zilamperest, malbata heteroseksîst yekîneya herî guncaw a rêxistinkirî ye. Ji ber vê yekê “stratejîyên parastina malbatê” tene pêşxistin. Mafên bidestxistî yên wekî hevberdan, nafaqa, kûrtaj û mîrasê ji bo mehkûmkirina jinan bi mîr û malbatê ra ji destên jinan tene stendin.

Ev yek aliyekî jeopolîtîka herêmê ye. Lê ev tenê rûyekî madalyayê ye. Li rûyê din ê madalyayê, rastîya jinan heye ku li dijî bûyîna biresera îstîsmara pergala kapîtalîst a zilamperest îtiraz dikin û ji bo wekhevî, azadî û rûmetê rêxistin dibin. Di nav vê rastîyê da, şoreşa jinê ya

Rojava, ku nirxên azadîya jinan bi awayekî serwer rêxistin û sazûmanî kirîye, di têkoşîna azadîya jinan da di pozîsyona rêberîya sîyasî da ye. Bêguman, şoreşa me ji aliyê leşkerî, sîyasî û îdeolojîk ve di bin dorpêçeka mezîna a zilamperest da ye.

Jina rêxistinkirî dê pêşengîya rêxistinkirina hemû civakê bike. Mînak, li Sûweydayê jinan çek hildan û xweparastina xwe girtin, ev mînakeka xweş a ji hev fêrbûyîna jinan e. Jina ku xwe diparêze, berevanîya xwe dike û hêza wê heye ku destên ku ber bi wê ve dirêj dibin bişkîne, hemû civakê rêxistin dike. Jina ku ji bo azadî, wekhevî û mafê biryara xwe bi xwe standinê şer dike, serkeftî dibe ku hemû civak ji bo parastina Rojava û rêveberîya xweser bibê yek. Hevpeymanîya şoreşger û demokratîk a jinan li seranserê Sûriyê dê bibê garantîya Sûriyeka demokratîk. Sûriyeka demokratîk dikare bibê bingeha Rojhilata Navîn a demokratîk. Jinên Rojavayî û Bakur Rojhilatê Sûriyê yên hişmend û rêxistinkirî îro xwedî hêza dîyarkirina qedera Rojhilata Navîn in. Û paşeroja jinên Rojavayî û Bakur Rojhilatê Sûriyê bi avakirina Rojhilata Navîn a demokratîk, ku bi şewaza komarên demokratîk hatine rêxistinkirin, ve girêdayî ye. Girêdana bi armanca Federasyona Sosyalîst a Rojhilata Navîn rêya yekane ye. Li pêşîya jinan du rê hene: “An hovîtî an sosyalîzm.” An em ê li vê cîhana xerabîyê mehkûm bibin, an jî em ê ji bo azadî û wekhevîyê rêxistin bibin. Rêyeka din tune.

Dîroka Têkoşîna li Dijî Tundîya li Ser Jinan û Rola Xwişkên Mîrabel

Nabe ku tundîya li dijî jinan, ji çarçoveyên sîyasî û civakî yê ku di dirêjahîya dîrokê da ew hewandine cuda were dîtîn. Ev tundî ne tenê rêşabûneka takekesî ye, lê pratîkeka bipergal e ku ji bo xurtkirina desthilatdarîya baviksalar û dîktatorîya sîyasî hatîye bikaranîn. Her çendî kokên vê tundîyê kevn bin jî, dîrokê ji serdema navîn heta serdema me ya nûjen di heman demê da têkoşînê dubare yê li dijî wê jî dîtine.

Di Dîrokê Da Nîşaneyên Berxwedanê

Di Ewropaya Serdema Navîn da, hewldanên sînordar ji bo astengkirina tundîya mêran li hember jinan bi hin kevneşopî û qanûnan derketin holê. Di cîhana Îslamî ya wê demê da jî, jinan destûr dît ku mêrên xirabkar berdin, ku ev yek hişmendîyeka zû ya li ser metirsîya tundîya nav malbatê nîşan dide. Her wiha, israra jinên wekî Fatima el-Fihriyê ku di jîyana zanistî û sîyasî da cih bigirin, regekî dijberîya li hember marjînalîkirinê temsîl kir. Ev qonax, her çendî belavbûyî bûn jî, bingeha hişmendîyeka kolektîf ava kirin ku tundîya li dijî jinan ne qedereka neçar e.

Ji Hiqûqa Civakî Berbi Rojava Sîyasî ve

Di sedsala 20an da, ev dosye bi temamî bû dozeka sîyasî. Tevgerên femînîst hem li rejîmên demokratîk û hem jî li yê dîktatorî, zext kirin ku kiryarên xwe binirxînin, û di encamê da peymanên navneteweyî derketin holê ku parastina jinan bi ewlehî, aramî û pêşketinê ve girêdan. Di dema Şoreşa Fransî da, çalakvan Olympe da Gouges ferq kir ku jin ji mafan bêpar in û di sala 1791an da Daxuyanîya Mafên Jin û Hemwelatîyê nivîsand.

Di vê daxuyanîyê da, wê daxwaza wekhevîya tam kir û cihêkarî û tundîya li ser bingeha zayendî red kir. Her çendî paşê hatibe darvekirin jî, ew yek ji wan dengên yekem e ku tundîya li dijî jinan bi cihêkarîya sîyasî û qanûnî ve girêda. Li Îngîlistanê, rêxistinên ku daxwaza dijwarkirina cezayên li dijî êrişên zayendî û tundîya nav

malbatê dikirin derketin holê û ji bo derxistina qanûnên ku destûrê didin jinan bikaribin mêrên xirabkar berdin, zext kirin.

Peymana Navneteweyî ya ji bo Rakirina Hemû Cureyên Cihêkarîyê li Dijî Jinan (CEDAW, 1979), ku ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve hate pejirandin, wekî yekem belgeya navneteweyî ya berfireh hate dîtîn ku dewletan mecbûr dike ji bo têkoşîna li dijî tundî û cihêkarîya li dijî jinan gavên berbiçav bavêjin. Paşê, di sala 1993an da, Daxuyanîya Neteweyên Yekbûyî ya li ser Rakirina Tundîya li Dijî Jinan derket û tekez kir ku tundî sûcek li dijî mafên mirovan e.

Îslamê qanûnên ku hin cureyên tundîya berîya Îslamê belavbûyî sînordar dikirin anî: Wekî qedexekirina zindîgorkirina keçan, qedexekirina êrişê fizîkî ya giranliserjinê, û sînordarkirina mesela "lêdanê" bi zagonên fiqhî yê hişk ku gelek fiqîhan ew ne fizîkî lê wekî simbolîk dîtîn. Pejirandina mafê jinan di mîratê da û xwedîbûna serbixwe ya darayî, jinan ji girêdayîbûna mutleq a ku dibe sedema îstîsmar û tundîyê parast.

Li Misir, Lubnan, Fas, Urdun û Tûnisê, kampanyayên wekî "bese", "ewlehî" û "Bi Hevre li Dijî Tundîyê" ji bo têkoşîna li dijî tundîya nav malbatê û tacîzê derketin holê. Mînak, di sala 2020an da, doza keça ciwan Amani li Misirê û doza Hannan el-Atr li Lubnanê, nîqaşên civakî yê berfireh li ser tundîya li dijî jinan vekirin.

Xwişkên Mîrabel: Perperokên li Hemberî Dîktatorîyê

Li vir mînakê herî berbiçav derdikeve holê: Xwişkên Mîrabel ên li Komara Domînîkî ne. Sê jinên ciwan ên ku di sedsala 20emîn da red kirin ku serî li ber rejîma xwînrejî a Trujillo bitewînin. Xwişkên Mîrabel di dîrokê da wekî sê jinên şoreşger ên ku li Komara Domînîkî jîyan kirine hatin tomarkirin. Navên wan Patria, Minerva û Maria bûn. Li welatê wan, Domînîka, dîktatorîyeka ku bi salan dom kir hebû. Di wan 31 salan da, hejmareka bêhejmar ji şoreşgeran kuşt, her kesê li dijî wî derket girt

û êşkence kir. Wî hemû jinên Domînîkî wekî milkê xwe dît û jinan neçar kir ku xizmeta wî û leşkerên wî bikin.

Di sala 1960î da, her sê Xwişkên Mîrabel jî ji bo beşdarbûna şahîyeka ku ji aliyê Trujillo ve hatibû lidarxistin hatin vexwendin. Xwişkên Mîrabel û malbatên wan neçar man ku beşdarî vê şahîyê bibin. Di vê şahîyê da, gelek jin rastî tacîzê hatin. Trujillo nêzîkî Minerva bû û jê xwest ku bi wî ra dans bike. Di dema dansê da, Trujillo Minerva tacîz kir. Lê Minerva, berevajî jinên din, li hemberî tacîzê bêdeng nema. Çi qasî hêza dîktator li dijî wê bû jî, wê netirsîya û ji bo rawestandina wî lê da. Piştî vê bûyerê, Trujillo bi hemû hêrsa xwe êrişî Xwişkên Mîrabel û malbatên wan kir.

Li Domînîkê, dem bi dem serhildan û tevgerên ji bo azadîyê derketin holê. Xwişkên Mîrabel jî di rêxistina 14ê Hezîranê da, ku rêxistineka nezagonî ya li dijî Trujillo bû, rêxistin bûn. Tevgerê ew wekî Perperok binavkirin. Xwişkên Mîrabel gelek caran ji aliyê Trujillo ve hatin zindankirin û wekî xayînen welêt hatin binavkirin. Trujillo hevjinên Xwişkên Mîrabel ên di zindanê da bûn şand zindaneka ji paytextê herî dûr. Xwişkên Mîrabel dizanibûn ku ev kemînek e, lê wan guh neda hişyarîyên hevalên xwe û ji bo dîtina hevjinên xwe ketin rê.

Di 25ê Mijdara 1960an da, di rêya vegeerê da, erebeyawan rastî kemîna leşkerên Trujillo hat. Her sê xwişk û şofêrê wan bi lêdan û xeniqandinê hatin kuştin. Berîya kuştinê,

Xwişkên Mîrabel rastî tecawîzê hatin. Têkoşîna wan ne tenê ji bo daxwazên jinan bû, lê di heman demê da li dijî zordariyê beşek ji tevgerêka sîyasî ya berfirehtir bû. Di 25ê Mijdara 1960an da kuştina wan a hovane, berxwedan neseandin, berevajî wê teqand. Xwişkên Mîrabel bûn sembola têkoşîna li dijî tundîya sîyasî û di heman demê da tundîya li ser bingeha zayendî.

Li ser şopa Xwişkên Mîrabel, îro bi deh hezaran jin li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, li "Rojava", bi her awayî li dijî faşîzm û dîktatorîyê têdikoşin. Jinan xwe rêxistin kirin û di hemû qadên sîyasî, leşkerî, îdarî û yê din da cih girtin, heta ku destkeftiyên dîrokî bi dest xistin û ji jinên cîhanê ra bûn mînak. Bi heman awayî, jinên li herêma Sûweydayê li başûrê Sûriyê li ser şopa wan meşîyan. Her ku jinên li Sûweydayê xwe rêxistin kirin da ku li dijî zulmê û faşîzmê têbikoşin, bi vî awayî têkoşîna dîrokî ya jinan li dijî zulmê û dîktatorîyê berdewam kir. Têkoşîna li dijî tundîya li dijî jinan ne tenê rêbazeka exlaqî ye, lê di heman demê da şerekî sîyasî ye ku xwezaya rejîmên ku civakan rêve dibin nîşan dide. Ji serdema navîn heta fedakarîyên Xwişkên Mîrabel û heta Neteweyên Yekbûyî, ev mijar bûye pîvana rêzgirtina dewletan ji mafên mirovan ra. Îro jî ev dijwarî berdewam dike: Ma jin dê wekî zincîra herî lawaz bimîne, an dê ji bo avakirina pergala sîyasî yê adiltir û biwicdantir bibe bingeheka sereke?



Ji bo Destûreka Sûriyê ya Azadîwaza Jinê û Demokratîk Têkoşînê Bilind Bikin!



Nivîsa destûrê ya bi sernavê "Daxuyanîya Destûrî ya Komara Erebî ya Sûriyê" hatiye weşandin, ji 53 madeyan pêk tê. Ger em pirsê bikin û bêjin, "Ka çend madeyên vê destûrê bi taybetî ji bo jinan in?" bersiva me dê tenê yek made be. Madeya 21ê wekî yekane madeya ku bi taybetî ji bo jinan hatiye vekirin û diyarkirin derdikeve pêşberî me. Başe, ev madeya 21ê çi dibêje?

"Dewlet statuya civakî ya jinan diparêze, rûmet û rola wan di nav malbat û civakê da misoger dike. Mafên perwerde û xebatê tekez dike. Dewlet mafên civakî, aborî û siyasî yên jinan misoger dike û wan ji her cure zordestî, neheqî û tundiyê diparêze." Berî ku em nirxandina madeya 21ê bikin, divê em li madeya 20an jî binêrin. Tê dîtîn ku madeya 21ê li ser bingeha madeya 20an hatiye nivîsandin. Madeya 20ê wiha dibêje: "Malbat bingeha civakê ye û dewlet soz dide ku malbatê biparêze."

Di Sûriyeya nû ya di bin rêveberîya HTŞê da, jin bi esasî divê li gorî rolên xwe yên jinbûnê yên di malbatê da tevbigerin û di bin kolebûna mêran da bikevin zindana malê. Rola ku bi esasî ji bo jinan tê xwestin ev e. Di pêvajoya ku tê jiyîn da du, sê, çar jinî, zewaca di temenê zaroktîyê da hê bêtir rewşa dibe. Li herêmên ku DAÎŞ û El Nusra desthilatdar bûn, lêkolînan diyar kir ku jin bi van pirsgrêkan ra rû bi rû mane. Niha jî rejîma HTŞê ya di xeta El Qaîdeyê da, jîyaneka civakî ya ku li ser zilamperesî û faşîzma îslama siyasî hatiye avakirin dimeşîne. Madeya 3emîn ya Destûra Sûriyê dibêje ku qanûnên îslamê bingeha qanûnsaziyê ne. Rejîma HTŞê şerîetê wekî model digire. Tê dîtîn ku ew hewl didin Sûriyê bikin wekî Efxanistana di bin rêveberîya Talîbanê de. Di warê polîtîkayên wan ên li ser jinan da, ji pratîkên wan ên dema El Nusra çend gavên zêdetir pêşde jî ji wan nayê hêvîkirin. Sedema ku em dibêjin "çend gavên zêdetir" ev e: bi vê nivîsa destûrê, bi esasî ji bo hêzên emperyalîst ên navneteweyî, yekdestên cihanî, herêmî û neteweyî di veberhênanên sermayê

da netirsin, hewcedarîya xapandina wan bi cîh hat. Herwiha, piştî hilweşandina rejîma Baasê, wan bi fênekî hewl da ku desthilata xwe ya paşverû û faşîst a HTŞê wekî ji Baasê demokratîktir û gelperwertir nîşan bidin. Lê belê polîtîkayên dijminê jin û gel ên rejîma HTŞê, ku di dawîya Mijdarê da desthilat girt, ji wê rojê heta îro li ber çavan e. Ka em li rastîyan binêrin. Tenê di warên kevneşopî yên wekî xizmetên civakî da ji jinan ra rol tê dayîn. Di sazîyên dewletê û cihên kar da mêr wezîfeyên bingehîn digirin. Li hin herêman serê jinan tê girtin, destwerdan li kincên wan tê kirin, li navenda kolanan dikevin pirsyarîyê. Pêkanînen wekî rûniştina li kursiyên paşîn ên otobusan belav bûne. Jin ne wekî hevparê civakê, tenê wekî dayik an jî hevjinê tê dîtîn. Li Şamê, li Meydana Emewî, mînakên ku bi zorê serê jinan tê girtin hatin jiyîn. Herwiha, mînakeka rojane: Wezareta Turîzmê ya Sûriyê, di 9ê Hezîranê da bi daxuyanîyekê, ji bo kesên ku diçin peravan û hewzên avjeniyê yên giştî, burkînî an cilên avjeniyê yên ku bedenê bi tevahî digirin mecbûrî kir. Ji mêran ra jî, ji bilî avjeniyê, îşlik (qemîs) li xwe kirin wekî şert hate danîn. Otêlên çar stêrk û jor, perav û hewzên taybet, û klûb ji van qanûnan hatin derxistin. Rejîma HTŞê li bajarên ku desthilat girtîye, li hemberî gelê Ereb ê Elewî qetlîameka mezin pêk anî. Li Lazkiye, Tartûs, Humus, Banyas û Hamayê bi hezaran Elewî hatin kuştin. Yên ku ji vê qetlîamê xilas bûn, ber bi herêmên Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Libnanê ve koç kirin. Di 13ê Tîrmehê da, di êrîşa rejîma HTŞê ya li ser Sûweydayê da, bi sedan Dûrzî jîyana xwe ji dest dan. Ji ber vê komkujîyê, bi hezaran Dûrzî ber bi Îsraîl û bajarên ku ew bi xwe ewle dibînin koç kirin. Zêdetirî 400 jinên Elewî û Dûrzî winda ne. Piştî êrîşên dawî yên li ser Sûweydayê, 103 jinên Dûrzî winda ne. Jinên tîn girtin, bi malbatên wan ra têkilî tê danîn û ji bo fîdyeyê dibin mijara bazarê. Tew di rewşên ku bi hezaran dolar tê dayîn jî, pîr caran pere tîn standin lê jin nayên

berdan. Em dibihîzin ku jin ji aliyê gelek mêran ve rastî tecawizê tîn, bi bihayekî bilind ji mêrekî ra tîn firotin, û bi zorê tîn zewicandin. Li Îdlîbê, ku bajarê desthilata HTŞê ye, bi agahiyên şênber hate îsbatkirin ku jinên Elewî tîn firotin.

Tam li vir em dixwazin madeyên derewîn ên Destûra Sûriyê ya nû binin bîra we: Madeya 3emîn ya Destûra Sûriyê dibêje: "...Azadîya baweriyê tê parastin, dewlet rêzê ji hemû olan ra digire û azadîya pêkanîna hemû ayînen olî garantî dike."

Madeya 10an: "Hemwelatî bêyî cihêkarîya nijad, ol, zayend û eslê wan, li pêş zagonan wekhev in."

Madeya 18an: "Dewlet windakirina bi zorê, êşkenceya fizîkî û psîkolojîk qedexê dike. Bêyî biryara dadgehê kes nayê girtin, azadîya wî nayê sînordarkirin."

Madeya 19an: "Parêzbandîya malan heye. Ji bilî rewşên di zagonê da diyarkirî, kes nikare bikeve malan an wan bigere."

Nivîsa destûrê ya bi sernavê "Daxuyanîya Destûrî ya Komara Erebî ya Sûriyê" weşandî, wekî ku ji navê wê jî diyar e, gelê Ereb wekî neteweya serdest dibîne. Rastîya civaka Sûriyê ya ku ji hêla gelan û bawerîyan ve dewlemend e, di destûrê da bi navê "Komara Erebî" ji destpêkê ve xisleteka faşîst tê dayîn. Erê, gava em li van madeyên zagonî yên derewîn jî dinêrin, 400 jinên Elewî û Dûrzî yên winda tîn bîra me. Rejîma HTŞê rejîmeke qirkirina jinan e. Hemû baweriyên cuda yên ji bilî gelên misilman di bin qirkirinê da ne. Êrîşa li ser kîlîseyê Şamê, êrîşên li ser gelên Xiristîyan, Elewî û Dûrzî ji ber baweriyên wan, mînakên rojane yên vê yekê ne. Gotinên ku rejîma HTŞê ya ku bi çekan serdagirtina mala jinan dike, wan bi êşkencê dikûje, tecawizê li wan dike û wan direvîne, di madeyên 18 û 19emîn ên destura xwe da dibêje bi temamî xapandin in.

Em komunîstên Rojavayî hemû jinan vedixwînin ku li dijî vê xapandinê bisekinin.

Dê berdewamîya vê nivîsê di beşa 3emîn a Dosyayê da bê.

KÛRTAJ MAF E

KÛRTAJ MAF E



Pirsgirêka kûrtajê bi salan, tew îro jî, ji aliyê dewletan ve wekî meseleyeka tenduristî, mafê zayînê û azadîya jinan nehatîye dîtin. Ji aliyekî ve wekî mijareka plansazîya nifûsê hate rojevê û li her devera ku bi vî awayî hate dîtin, di qonaxa biryargirtinê da ne jinan, lê desthilatên zilamperest gotinê xwe gotin. Herwiha, desthilatdarîyên zilamperest, ji bo jinan di malan da heps bike dinyaya wan tenê bi zarokan sînordar kir. Ev ji bo xurtkirina desthilatdarîya xwe bikar anîn.

Em behsa erdingarîyekê dikin ku ji destpêkê ve jin wekî dayik tê dîtin. Welidîna jinê ango wê çend zarokan bi welidîne û çend ji van wê lawik bin ev pir girîng e. Ev wek têkerîya herî mezin a jinê ya di nav malbatê da tê dîtin. Jina ku nawelidîne tê biçûk xistin, ji derveyê civakê tê hiştin. Zexteka pir mezin li ser jina nawelidîne çêdibe. Li vê erdingarîyê zagonên ku ferzkirinên exlaqî dipejirînin hene. Li bendê mayîna ku ev zagon mafê jinan biparêz, dê bibe xeyalek.

Keçkek ku hîn bi xwe zarok e, wekî xwişkeka mezin tê hêvîkirin ku li xwişk û birayên xwe binêre û çavdêriyê bike; bêguman di pêşerojê da jî jê tê xwestin ku bibe dayikeka baş. Tiştê berevajî vê nayê fikirîn. Ji ber ku nirxên civakî yên ku tên parastin jinê ne wekî takekes, lê wekî "dayik" dîyar dikin. Ramana "cihê jinê mal e, gel hevjin û zarokên wê ye" ji aliyê her kesî ve wekî prensîbekê hatîye qebûlîkirin. Ev prensîb

encama zagonên exlaqî ye ku jinê wekî dayikeka baş dibîne ye. Pergala kapîtalîst ku jina zewicî wekî milkê hevjinê wê dibîne, biryara zayînê an nezayînê jî ji destê jinê digire û dide mêr. Ger mêr bixwaze, jin neçar dimîne ku ducanîyê bidomîne. Jina ku li cem mêrê xwe namîne û dayiktîyê ji zarokên xwe ra nake, nayê pejirandin. Ji aliyekî din ve, dayiktî tenê di nav yekîtîya zewacê da tê pejirandin. Jina ku bêyî zewacê zarok tîne, wekî bêexlaq tê dîtin, zarok jî wekî "zarokê bêkok" tê binavkirin. Di vê rewşê da jî sifata dayiktîyê dîsa exlaqa civakî dide.

Di civakeka ku dayiktî bi vî rengî bi nirxên exlaqî ve girêdayî ye, divê hiqûq ne wekî dayik, lê wekî "jin" takekesê biparêze. Divê maf û azadîya jinê ji sifata dayiktîyê cuda bi awayekî hiqûqî were pênasekirin û sînoren wê bi exlaqê neyên xêzkirin. Lê belê li Rojhilata Navîn, ku feraseta exlaqî serdest e, qanûnên alîgirê mêran jî bêalî nemanê û di rêzîknameya kûrtajê da (di biryara jina li ser bedena xwe de) sînoren demkî hatine danîn. Li gorî qanûnan, eger zarok bi temamî û sax bê dinê mirovek tevî civakê dibe û mafên xwe distîne. Cenîn a ku hîna di zikê dayîka xwe da çênebûye, ne zarok e. Li vir bi awayekî zelal tê fêmkirin ku cenîn wekî zarok, jin jî wekî dayik tê dîtin. Jin û doktorên ku ducanîyê bi dawî dikin, li piranîya welatan ceza digirin. Cezaya ku tê plankirin, bersivek ji bo wê yekê ku

jina ku dayiktîyê red dike, sazûmana dayiktîyê ya ku wekî pîroz tê qebûlîkirin xera dike.

Madeya mafê hîlbijartina zayînê ya azad û bi wijdanî ya di Daxuyanîya Mafên Zayendî ya Yekîtîya Tenduristîya Zayendî ya Cîhanê da, bidawîkirina ducanîyê ya bi daxwazî wekî maf pênase dike; di heman madeyê da behsa mafê hîlbijartina bûyîna xwedî zarok an nebûyîne, biryara li ser hejmara zarokan û demên di navberên wan da, û girîngîya gihîştina tam a hemû dermankirinên têkildarî rêzîknameya van mafan jî tê kirin. Di cîhana îro da, li 73 welatan kûrtaj azad e, lê li 68 welatên wekî Brezilya, Şîlî, Meksîka, Kolombîya, Domînîk, Îran, Sûriye, Endonezya û Efxanistanê kûrtaj qedexe ye. Lê belê qedexeya kûrtajê, li her devera cîhanê û li Sûriyê jî, ji bilî metirsîdarbûna li ser jîyana jinan tiştêkî din bi xwe ra neaniye. Tew ku kûrtaj qedexe ye, hejmara jinên ku kûrtaj dikin an jî bi rêbazên cuda yên wekî ji bilindahîyê xwe avêtin, tiştên giran hildan, boyaxkirina por, vexwarina hin nebatên kelandî (pîvaz, darçîn) an vexwarina kolaya ku bi dermanan hatîye kelandin, dawî didin ducanîya xwe, pir zêde ye. Li gorî raporên Rêxistina Tenduristîyê ya Cîhanê (WHO), li welatên ku kûrtaj qedexe ye, ji ber kûrtajên di şertên netendurist da her sal 68 hezar jin jîyana xwe ji dest didin. Roja Kûrtaja Ewle, yekemcar di 28ê Îlonê ya sala 1990î da li Karayîb û Amerîkaya Latîn ji bo rakirina

sûcdarkirina kûrtajê wekî rojeka çalakîyê derket holê. Di sala 2011an da jî, ji ber ku li gelek welatan gihîştina kûrtaja ewle û qanûnî ne maf bû, 28ê Îlonê wekî Roja Kûrtaja Ewle ya Navneteweyî hate ragihandin. Roja Kûrtaja Ewle ya Navneteweyî, ji bilî wekî maf pejirandina kûrtajê, li dijî sûcbarkirina jinan ji ber kûrtajê û cihêkarîya ku ew dijî têkoşînê esas digre.

Feraseta ku li ser bedena jinê serdestî ava dikin pir kevn in û mixabin naskirî ne, lê têkoşîna jinan a di vî warî da jî bi heman rengî xwedî dîroka kûr e. Em wekî Jinên Komunîst ên Şoreşger dizanin ku rojekê dê nîqaşên li ser mafê bidawîkirina ducanîyê ya bi daxwazî bibe dîrok û daxwazên me yên rewa dê bi cih bên. Ji bo vê yekê em ji îro ve têdikoşin. Di 28ê Îlonê Roja Kûrtaja Ewle ya Cîhanê da, em wekî jin carek din bi dengê bilind dîyar dikin ku mafê gotinê li ser bedenên me tenê ya me ye. Em we vedixwînin ku piştgirîya jinê bilind bikin, li dijî zîhnîyeta paşverû ya mêrserwer di nav refên JKŞê da têbikoşin. Ji bo ku em mafê kûrtajê bidest bixin û rê li ber mirina 68 hezar jinên her sal ji ber redkirina zayîna zarokan dimrin bigirin, li cem me bin. Li dijî zîhnîyeta paşverû ya mêrserwer ku aqilê jinê paşguh dike, hestên wê nabîne, daxwazên wê biçûk dixê, tu jî bêje "êdî bes e". Keda me, bedena me, nasnameya me, ya me ye! Mafê gotinê jî ya me ye.

Emîne Ocak



Emîne Ocak, di sala 1937an da li Dêrsimê hat dinê. Hê nû hatibû dinê, bi malbata xwe ra ji ber zextên rejîma faşîst a Tirkîyeyê ya wê demê neçar ma ku erdên xwe biterikîne. Di sala 1937an da, dema ku Emîne radikirin bi tirs ku "zarok dê bigrî û ew ê me bibînin" xwe veşartin. Emîne, beşek ji jîyana xwe li Elezîzê derbas kir. Di salên 1980yî da, ku salên herî tarî yê Tirkîyeyê bûn, wekî ku keça wê tarif kir, her êvarê li benda rêya zarokên xwe bû. Ango Emîne Ocak, di bin zextên dewleta faşîst da mezin bû û zarokên xwe jî di van şertan da mezin kir. Kurê Emîne Ocak, Hasan Ocak, ciwanekî komunîst, şoreşger û endamê MLKPê bû. Hevrê Hasan Ocak, bi salan di "bin erdê" da têkoşîna neqanûnî (îllegal) meşand. Ji bo hevrê Hasan wiha digotin: "Mîlîtanek bû ku bi salan di matbaaya neqanûnî ya partiyê da bêyî ku rojekê gazind bike, xebat meşand." Hevrê Hasan Ocak, di 12ê Adara 1995an da li taxa Gazî ya Stenbolê serhildan bi rêve bir. Dewletê hewl da ku gelê Sûnnî û Elewî li dijî hev bihêle û Elewîyan di komkujîyê ra derbas bike, lê bi pêşengîya MLKPê, xwişk û biratîya gelan hate avakirin, bindestan li dijî dewletê dest bi serhildanê kirin û hevrê Hasan bû yek ji fermandarên vê serhildanê yê ku nayên jibîrkirin.

Dewleta faşîst di 21ê Adarê da hevrê Hasan revand, bi êşkenceyên giran ew şehîd xist û dewleta faşîst înkâr kir ku ew revandîye. Wê demê, yek ji rêbazên herî berbelav ên dewleta faşîst a Tirk, kuştina di bin çavan da bû. Ji mirovên ku ji aliyê çeteyên dewleta faşîst a

Tirk ve hatin revandin û kuştin ra digotin "faîlî meçhûl" (kujer nediyare). Di destpêkê da hat înkâr kirin ku Hasan Ocak di bin çavan da ye. Dayika Emîne her roj derket kolanan û li dijî polîsan berxwedan kir. Ev berxwedana wê gel xist nav liv û tevgerê. Cenazeyê hevrê Hasan, piştî 55 rojan, bi şopên êşkenceyên giran, li goristana bêkesan a Beykoza Stenbolê hate dîtin. Dayika Emîne, di 27ê Gulana 1995an da bû kevirê bingehîn ê kevneşopîyeka mezin a berxwedanê. Wê rojê, roja şemiyê, Dayika Emîne bi wêneyê kurê xwe hevrê Hasan û bi kulîlkekê li Qada Galatasarayê ya Stenbolê dest bi rûniştinê kir. Tenê daxwazek wê hebû: kuştinên 'Faîlî meçhûl' bi dawî bibin û edalet cihê xwe bibîne! Ji wê rojê şûnde, her şemî hejmara kesên ku li xizmên xwe digerîyan zêde bû û berxwedana Dayikên Şemiyê bû têkoşîneka mezin. Berxwedana Dayikên Şemiyê heta îro jî didome. Heta niha, her şemî dayik û xizmên windayan dicivin, lê di dîrokê da hin hûrgilî jî hene. Dayikên Şemiyê di hefteya xwe ya 100emîn da bûn dengvedanek navneteweyî çêbû û Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê û rêxistinên mafên mirovan ên navneteweyî dest bi şopandina wan kirin. Di hefteya 200an da, sala 1999an, dewleta faşîst bi tundî destwerdan kir, Dayikên Şemiyê nekarîn bicivin û "serdema bêdengîya bi zorê" dest pê kir. Di 31ê Çileyê 2009an da, dîsa li Qada Galatasarayê dest bi kombûnê kirin û "serdema bêdengîya bi zorê" bi dawî bû. Hefteya 500ê, di 25ê Cotmeha 2014an da, bi tevlibûna bi hezaran kesan

pêk hat. Di hefteya 700an da, 25ê Tebaxa 2018an, dewleta faşîst çalakî qedexê kir, polîsan bi tundî destwerdan kir. Gaza îsotê û guleyên plastîk hatin bikaranîn, gelek kes hatin binçavkirin. Dayika Emîne, wê demê 82 salî bû, bi wêneyê kurê xwe û kulîlkek di destê xwe da, di nav kesên binçavkirî da bû. Dayika Emîne li erdê hate kaşkirin û ji aliyê polîsên dewleta faşîst ve hate birin. Wan dîmenan di raya giştî da dengê mezîna da. Her çendî Qada Galatasarayê ji aliyê dewleta faşîst ve hate girtin jî, Dayikên Şemiyê her şemî li ber Komeleya Mafên Mirovan a Stenbolê kombûna xwe didomînin, lê Dayika Emîne di 22ê Tîrmeha 2025an da jîyana xwe ji dest da. Dayika Emîne, 30 salan her jemiyê li wir bû û qet dev ji lêgerîna edaletê berneda. Her carê digot "Ën winda dikin dê winda bikin" û rêwîtiya xwe ya dawî li Qada Galatasarayê bi tevlibûna bi hezaran kesan pêk anî. Ji ber ku Dayika Emîne di nav 30 salan da bibû dayika hemû şoreşgeran. Her çendî cenazeyê kurê xwe hevrê Hasan hate dîtin jî, wê bi dayikên din ra têkoşîna xwe domand. Ew êdî yek ji sembolen Dayikên Şemiyê "Dayika Emîne" bû.

Berîya çalakîya Dayikên Şemiyê li Arjantînê, ji aliyê dayikên şoreşgerên ku ji hêla dewletê ve di bin çavan da hatibûn windakirin, di sala 1977an da li "Plaza da Mayo" çalakîyek bi vî rengî dest pê kiribû. Di rejîma faşîst a Arjantînê da şoreşger dihatin revandin, di bin êşkenceyên giran da dihatin kuştin û ji malbatan ra nedihatî ragihandin. Dayikên Arjantînê

her şemî bi wêneyên zarokên xwe û kulîlkan li "Plaza da Mayo" dicivîyan. Piştî, ev têkoşîna di salên 1980yî da li Filistinê ji aliyê dayikên Remallahê ve hate destpêkirin. Ew li ser çarenûsa zarokên xwe dipirsîn û li dijî dagirkerîya Îsraîlê derdiketin kolanan. Li Bakurê Kurdistanê û Tirkîyeyê, çalakîya yekem ji aliyê Emîne Ocak ve hate kirin û ew bû pêşenga Dayikên Şemiyê.

Berxwedana dayikên Arjantînê, dayikên Remallahê û piştî berxwedana Dayika Emîne, hemû bûn pêşengên lêgerîna edaletê li dijî rejîmên faşîst. Dayik û hevjinên Belûcistanê jî bûn beşek ji vê lêgerîna edaletê. Piştî ku bi hezaran Belûcî di bin çavan da hatin windakirin û bûn faîlî meçhûl, jin derketin berxwedanê. Di sala 2013an da, ji bajarê Quetta yê Belûcistanê heta paytexta Pakistanê, Îslamabadê, meşeka dirêj kirin. Yek ji dayikên herî naskirî "Mama Qader" bû, wê ji bo kurê xwe lêgerîna edaletê dest pê kir, û Farzana Majeed ji bo birayê xwe di têkoşînê da derket pêş. Ev mînak hemû, mînakên jinên ku rejîmên faşîst jê ditirsîn in. Di vê mînakê da, dayika me Emîne. Wekî Dayika Emîne, bi hezaran mînakên din hene. Em jin, ji bo ku tarîtiyê derxînin ronîyê, ji bo ku edaletê bi cih bînin, ji bo ku hesaba êşên ku dane me bipirsîn, her tim li ser pîyan bûn û dê li ser pîyan bin. Ji Rojava heta Tirkîye, ji Tirkîye heta Belûcistan, ji Belûcistan heta Xeze, ji Xeze heta Arjantîn û dinê. Dayika Emîne di têkoşîna me da dijî û dê bijî!

GOTINA KU EM BÊJIN HEYE

Sala dawî da di jîyana me da tiştên ku timî diguherin çêdibin. Rejîma BAASê ango Esed ê ku ji dema ku me xwe nas kirîye ve heye, di çend rojan da hilweşîya. Li şûna wê komek bi navê HTŞ hat. HTŞ yekser ket navenda jîyana me wekî nîşanek pirsê. Ev Colanî kî ye? Ev HTŞ ji ku derê derket? Çima jê ra çete dibêjin? An jî ev HTŞê dê di jîyana me da çi guhertinan çêbike? Em ê bi hev ra di nivîsa xwe da hewl bidin van pirsan bibersivînin û fêhm bikin.

Baş e, ev rejîma nû ya Şamê, Heyet Tahrîr El Şam kî ye? Çeteyê bi navê HTŞ, di sala 2017an da ji aliyê Colanî, serokê rejîma nû ya Şamê ve, hatiye damezirandin. Kokên wê ji El Qaîdeyê, ku di heman demê da afirînerê DAÎŞê ye, tê. El Qaîde ji sala 2012an ve êrişî axa Şoreşa Jinan a Rojavayê û hemû Bakur û Rohilatê Sûrîyê dike. Ango bi xwe DAÎŞ e.

Me bi kêmanî carekê li ser medyaya civakî an jî li ser televîzyonê dîmenên kuştina Elewî û Dûrzîyan yên li Sahil û Humusê dîtine. Çeteyên HTŞê yên ku jinên Elewî û Dûrzî revandin û wekî berê bi salan li Şengalê li jinên Êzîdî kirin, firotin. Yên ku ji ber bawerî û nasnameya wan mirov wekî kûçikan dan ewtandin, dîsa leşkerên HTŞ bûn. Yên ku li Şamê, çar hevalên me yên xwendevan ên ji Qamişloyê revandin, ew bûn. Ev mînak jî ne ji salên berê ne, di çend mehên dawî da qewimîne. Ango tiştên ku em dibêjin "çete" ev e. Me wekî jin di van axan da dogeh bi zindî jîyankir. Di şeran da yekem em bûn armanc. Em hatin revandin, li me tecawiz hate kirin, em hatin firotin. Yên ku dogeh li me dan jîyandin, çeteyên dijminê jinan HTŞ bû.

Îro rejîma dijminê jinan HTŞ hatiye desthilatdariya Sûrîyê. Dema hat, destpêkê gelên ji derveyî pergala wî ya yekperestî man qetil kir, paşê jî ji bo avakirina pergala xwe, bernameya xwendinê ya dibistanan guhert. Li vê xalê, ev mijar bû mijarek di navenda jîyana min û te, û me hemûyan da.

Pirsên ka ev guhertin çi ne, em ê wisa bersiv bidin:

1-Di dersên Dîrok û Zanistên Civakî da, têgeha "dagirkirina dewleta Osmanî" hate guhertin û li şûna wê "rêveberîya Osmanî" hate danîn. Niha hûn ê bibêjin, ev



çima ewqas girîng e? Dewleta Osmanî hem di parçekirina Kurdistanê da hem jî di mêtînghekirina parçeya Bakur da lîstikvanê sereke bû. Dewleta Osmanî pêşîya dewleta faşîst a Tirk a ku îro Efrîn, Serêkanîyê, Girê Spî û Minbicê dagir kirî ye û hem çek û hem jî perwerdeya leşkerî dide DAÎŞê. Ev guhertin nîşana peymanê di navbera dewleta dagirker a Tirk û çeteyên dijminê jinan HTŞê da ya di warê perwerdeyê da ye. Dagirkirina dewleta Osmanî wekî "rêveberî" binavkirin, di me ango nifşê nû da, hişmendîyekê çêdike û dikeve zimanê me. Bi vî awayî hinek tiştên normalîzekirin. Nifşê nû êdî dewleta Osmanî wekî dagirker pênase nake. Bînin bîra xwe: Dijminê bav û kalan nabe dost.

2-Guhertineka din jî di warê Zanistên Fenê da ye; teorîyên werarê û Teqîna Mezin ji bernameya xwendinê hatine derxistin. Ew dixwazin perwerdeyeka paşverû û ji zanistê dûr li ser me ferz bikin. Ev teorîyên ku li seranserê cîhanê têne qebûl kirin û cîhanê bi awayekî berfireh şîrove dikin, me ji wan dûr dixin. Nikarin paş da mayîn û ji zanistê dûr ketinê li me ferz bikin.

3-Guhertineka din jî ji bernameya xwendinê derxistina dersa Felsefeyê ye. Rakirina dersa felsefeyê,

ji bo me jinên ciwan ên ku bêtir pirsan dikin, difikirin, ji nûbûnê ra vekirî ne, hêza me ya pirsînê û nêrîna me ya rexneyî ji holê radike.

Di nav vê pergala perwerdeyê da, wekî jin, çûyîna dibistanê jî ji bo hinan ji me dibe pirsgirêkek. Ger di nav malbatê da pirsgirêkek hebe, yekem tiştê ku tê qurbankirin jîyana me ya dibistanê ye. Dayîka me nexweş dibe, em ji bo alîkarîya wê naçin dibistanê. Carna wisa tê kirin ku em di malê da xwe wekî zêde hîs bikin, zewaca xwe wekî rizgarîyekê dibînin. Carna jî wekî modekê... Dema em nexwînin, jîyana me ji nav destên me diherike. Piştî temenekî di mala malbatê da em dibin serîyek zêde, an jî dema zewaca me nebaş derbas dibe em bi zarokên xwe di dest da vedigerin, neçar dimînin ku serê xwe li hember gotinên derdorê bitewînin. Ev jî jîyana ku li me tê ferzkirin e.

Em dê nepejirînin û napejirînin ku bibin jinên ciwan ên ku nafikirin, ji her tiştî ra "erê" dibêjin û li ser jîyana xwe biryarê jî nadin. "Bêdeng be keça min", "wer keça min", "xwarîne çêke keça min", "bi wî ra nepeyive", "bi vî ra bizewice"... Na, em ê bi xwe biryar bidin ka em ê jîyana xwe çawa bidomînin.

Erê, em dizanin û ez bawer im hemû xwişkên me yên vê nivîsê dixwînin jî dizanin ku

li pêşîya me jîyaneka mezin heye. Em ê vê jîyanê li gorî daxwaz û ramanên kesên din xera nekin, tu jî xera neke hevala min. Nebêje ku heta niha wisa hatiye, bila wisa biçe! Em ji xwe ra vê jîyanê rewa nebînin. Em jî hene, gotina me jî heye, em ê vê yekê bi qîrîn bêjin.

Werîn hêza Şoreşa Jinên Rojavayê di dilê xwe da hîs bikin. Werîn bi hêza ku ev şoreş dide me, jîyana xwe serûbin bikin. Wekî şehîd Yasemîn Çiftçî ya komunîst gotîye: "Em ji ku dizanin binê jîyana me ji serê wê xweştir e an na?" Werîn wêrek bin û gav bavêjin. Em hemû heman tiştan dijîn, heman tiştan hîs dikin. Ji hev cudahîyek me tune. Me heman êş kişandine, heman pirs pirsîne, heman tirs jîyankirine. Lê em dizanin ku tenê tiştên ku dê me rizgar bike rêxistinbûn e. Me bi vê zanîne gavek avêt. Em birêxistin bûn. Me bi CKŞ-Jin fêhm kir ku rizgarî bi tena serê xwe nabe. Me dît ku eger em yek bin, em ê bibin hêz.

Xwişka me ya hêja ya ku vê dixwîne, ji bo bibêjî "Em jî li vir in", were em li dijî pergala HTŞê ya dijminê jinan, zilamperest, burjuva û yekperest têbikoşin. Werin em şoreşa jinan mezin bikin. Di nav refên Ciwanên Komunîst ên Şoreşger-Jin (CKŞ-Jin) da rêxistin bibin. Em pêşerojin, paşeroja me di sosyalîzmê da ye!

HESEKÊ:

Endamên JKŞê di çarçoveya çalakîyên 28ê Îlonê Roja Kûrtaja Ewle ya Cîhanê da civînek li dar xistin.

Berdevka JKŞê Fadya Sîdo bal kişand ser polîtîkayên dewleta zilamperest ên di derbarê laşê jinan de. Fadya Sîdo diyar kir ku jin li ser laşê xwe xwedî biryara dawî ne û tekez kir ku kurtaj mafek e.

**QAMIŞLO:**

Endamên Jinên Komunîst ên Şoreşger (JKŞ) li Qamişloyê bi boneya salvegera ji aliyê rejîma faşîst a melayên Îranê ve kuştina Jina Mahsa Emînî, daxuyaniyek dan.

